Universität Bremen

Rapora Projeya Lêkolînê ya „Berhevanîna Tevgerên Jinan a li Nav Tirkiyê“

III.1.B. Tevger(ên) Jinan (ên Femînîst)? Pêşniyarên Pênasekirinê yên Pispor*ên Siyasî yên Jin û Zayenda Civakî

Charlotte Binder & Yasemin Karakaşoğlu

Îlon 2017



blickwechsel
Studien zur zeitgenössischen Türkei
Ein Programm der Stiftung Mercator

III.1.B. Tevger(ên) Jinan (ên Femînîst)? Pêşniyarên Pênasekirinê yên Pispor*ên Siyasî yên Jin û Zayenda Civakî

Pênaseya tevgerên jinan ku divê têşeyên civakî yên pirjimarî û transnetewî bigre nava xwe, divê di heman demê de him pirrengiya civakê û him jî lêkolînên derbarê tevgerên civakî (yên nû) [1] bigre ber çav, bihêstirî nêzîk nebe û ji azmûnê re vekirî be. Li gor vê Lenz xwe dispêre pênaseya Helma Lutz û tevgerên jinan wek li jêr dinirxîne:

> […]aktorên kolektif ên birêxistinî, ku di nav derdorên cuda yên civakî-dîrokî de pêşdikevin [dinasîne.] Di nava wan de kesên ku bi piranî ji jinan pêk tên, ji bo guhartineke esasî di têkiliyên zayendî de û girêdayî vê di newekhevî û ji qîmet xistinê de bê çêkirin, cihê xwe digirin. Ev [kes] model, nirx û nîqaşên serdest ên civakî rexne dikin û alternatîfên vê yekê ku dê nirxên nû ava bike, pêşdixînin. Tevgerên jin tevlî pêvajoyên modernîteyê dibin û bi awayên cûrbecûr tê de cihê xwe digirin, bandor dikin, asteng dikin an jî berê wê diguherinin […]. (Lenz 2010: 867–868)

Lenz di pênaseya xwe de balê dikişîne ser „ahengdariya teorîya çalakbûnê“ ango „ketina meriyetê(pratîkê) (ango çalakbûna birêxistinê û kolektîf)“ ya tevgera jinan û bi vê pênaseyê „kes“an wek „kirdeyên birêxistina kolektîf“ dinasîne û bi vî awayî balê dikişîne ser „têkiliyên guherbar ên takekesî û tevgerên jinan“ û herweha ser „tecrube û daxwazên cuda“, ku wek mînak „jinên dixebitin, dayik, lezbiyen, koçber an jî zilam di çarçoveya xwe de sekna xwe ya civakî bi xwe re tînin.“ Bi vî awayî li gorî Lenz damezirandina tevgerên jinan di „çînên cuda, derdorên etnîk û çandî yên cuda“ de, ango bi awayekî „pirjimarî“ pêş dikeve (Lenz 2010: 867–868). Li gorî Lenz aktor*ên ku di nav van tevgerên civakî yên pirjimar-pênase de cihê xwe digirin di avaniyên civakî yên di asta mikro, mezo û makro de ji bo guhertineke di têkiliyên

[1] Tevger(ên) jinan wek fenomeneke dîrokî û siyasî bi teorîyên ku ji hêla lêkolînên civakî yên nû hatine pêşxistin, tên pênase kirin. Gelek pênaseyên derbarê tevgerên civakî yên nû de hene (Lenz û Paetau 2009: 37). Wek oryantasyona vê lêkolînê pênaseya Della Portas û Dianis bingehîn e: „têkiliyên nefermî, yên ku li ser esasa bawerî û piştgiriya hevpar tên li darxistin û di derbarê pirsgirêkên bi nakokî de têşeyên protestoyê yên cuda bi kar tînin.” (Della Porta und Diani 1998: 16) Ev pênase, ku tê de avakirina nasnameya kolektîf ne krîtereke esasî ya tevgera civakî ye, him bi taybetî, him jî vekirî ji bo mijara tevgerên jinan ên li Tirkiyê têrî dike. Ji salên 1990’an vir de ye nîqaşên ku ji hêla lêkolînerên tevgeran ve tên meşandin, nasnameya kolektîf wek „hêmana sereke ya tevgerên civakî“ (Daphie 2011: 13) tê dîtin. Ji ber vê sedemê divê di vê xebatê de jî girêdana kirdeya (subjekt) kolektîf ‚em jin‘ bê berçav girtin.

zayendî de bê çêkirin, tevdigerin (Lenz 2002: 36–37).

Bi vê têgihiştina teorîk ev lêkolîna di destê we de ye bi pirsên wek; pisporên di nav vê xebatê de cihê xwe girtin pênaseya „tevgera jin“ çawa dinirxînin û bi taybetî wek pêşniyara pênaseya vê projeyê „tevgerÊN jinan“ wek pirjimarî çawa digirin dest, eleqeder dibe. Ji bo tespîtkirina bikaranîna peyva „tevger(ên) jinan“ di çarçoveya lêkolîna li Tirkiyê de, girêdayî vê nivîsê hatin nirxandin. Ji bo vê yekê transkrîptên hevpeyvînan, bi taybetî bersîven pirsa „li gorî nêrîna we tevger(ên) jinan çi ne?“[2], herweha pirsa li dû wê „li gorî nêrîna we kîjan tevger di nav tevger(ên) jinan de dikarin cihê xwe bigirin?“[3] bi awayekî berhevdan hatin analîz kirin.
Li gorî nirxandinan derket holê ku tevgerên jinan ji hêla hevpeyvîner*an ve wek tevgerên civakî yên serkeftî û dînamîk li Tirkiyê tên şîrove kirin (wek mînak: Bulut 2015: 7; Anonym 2014: 15; Kapusuz Kütküt 2014: 15; Üstün 2014: 12). Serpil Sancar tevgera jinan wek „rêxistineke siyasi“ (*bir siyasal örgütlenme*) ku azadiya jinan daxwaz dike û ji bo vê yekê çalakiyan bi rêxistin dike, şîrove dike (Sancar 2014: 17). Zanyara ku li Zanîngeha Enqerê dixebite bi awayekî berfireh tevgera jinan pênase dike:

> […] tevgera jinan ji bo azadiya jinan çalakiyên pêwîst, aktîvîteyên civakî digire navenda xwe, ji hêla grubên jin ên cuda cuda tê damezirandin û bi bandora têkiliyên wan ên bi hev re wek rêxistineke siyasî derdikeve holê.[…] rêxistineke sîyasî [ye], em dikarin bêjin têkiliyên berwarî esas digire, di qada sîvîl de xwe bi rêxistin dike, giringiyê dide azadiyan, ji komên jinan û çalakiyên wan ên siyasî pêk tê. (Sancar 2014: 20)[4]

Dema ku zanyara polîtolog bi taybetî qala rêxistinbuyin û çalakiyên komên jinan û armancên wan – „azadiya jinan“ (*kadınların özgürlüğü)* – [5] dike, hevpeyvînerên din di pênaseyên xwe de balê dikişînin ser sedemên çalakiyên sîyasî yên jin û zayendî. Wek mînak tevgera jin wek

[2] „Sizce kadın hareket(ler)i nedir?“
[3] „Sizce kadın hareket(ler)ine hangi hareketler dâhil görülebilir?“
[4] „[…] kadın özgürleşmesi için gerekli eylemleri, toplumsal aktiviteleri merkezine alan, örgütlenmiş farklı farklı kadın gruplarından oluşan, onların bir arada etkileşiminden oluşan bir siyasal hareket, kadın hareketi. […] bir siyasal hareket, daha yatay ilişkilenen, daha sivil alanda örgütlenen, daha özgürlükler odaklı örgütlenen kadın grupları ve onların siyasal eylemliliği diyebiliriz.“
[5] Herweha ji bo Gülsen Ülker a ji Weqfa Piştgiriya bi Jinan KDV ya li Enqerê jî tevger(ên) jinan dikarin li gorî rêxistinbuyîn û armancên xwe yên hevpar bên karakterîze kirin. (Ülker 2014: 16).

„bertekek“ *(bir reaksiyon),* herweha wek „serhildanek“ *(bir başkaldırı)* ku li dijî bindestiya sedsalan (Anonîm 2014: 20) û ji bêgaviyê hatiye avakirin, tê şîrove kirin (Semiz 2014: 18). Aktîvîsta Kurd a ji Amedê Mukaddes Alataş tevgera jinan wek „komên li dijî sîstema nêrza ya serdest, hişmendiya serdest û li dijî rolên zayenda civakî tekoşîna hebûnê dimeşînin“ *(erkek egemen sisteme, zihniyete, toplumsal cinsiyet rollerine karşı bir varlık mücadelesi veren gruplardır)* şîrove dike (Alataş 2015: 17).

Zanyar Özlem Şahin Güngörê ji Muglayê balê dikişîne ser meylên siyasî-bîrdozî yên cuda yên di nava tevgera jinan.Li gorî nêrîna wê tevgerên jinan li gorî hişmendiya jinên ku di nav sazîyên têkel (karma) de bi rêxistin kirîne tevdigerin (Şahin Güngör 2015: 26). Hin hevpeyvîner* behsa di nav hev de derbasbuyîna kapîtalîzm û baviksalariyê dikin; bi vî awayî sekna civakî ya jinan bi awayekî hevbirînî (intersectionality) şîrove dikin (wek mînak Akgün 2015: 14; Can 2015: 20; Çağlayan 2014: 26). Li gorî Nurcan Vayiç Aksu ya ji sazîya çepgirt Meclîsên Jinên Sosyalîst SKM ji Hopayê divê di tekoşîna civakî de nasnameya bedenê bi nasnameya „çînî“ bê girêdan (Vayiç Aksu 2015: 15). Têkiliya binyata kapîtalîst û baviksalar ji hêla Bahar Bostan a ji Komîsyona Mafên Jinan a girêdayî Baroya Trabzonê ve jî tê vegotin. Li gorî Bahar Bostan di navbera tevgera jinan û ,tevgera çînî‘*(sınıf hareketi)* de cudahiyeke tûj nikare bê kirin (Bostan 2015: 14).

Dema ku ji bo hin hevpeyvîner*an hemî rêxistinên civakî yên ji bo pirsgirêka jinan tevdigerin û daxwazên sîyasî yên wekheviya zayendan formule dikin, wek tevgereke jin tên pênase kirin (wek mînak: Acar 2014: 8; Cön 2015: 14; Anonîm 2015: 4), parezêr Ayla Varan a ji Artvînê tevgera jinan wek tevgereke ku ji tekoşîna li hember şîdeta jinan xwe damezirandiye, pênase dike (Varan 2015: 19).

Tevger(ên) jinan di hevpeyvînan de hin caran bi perspektîfeke heremî û girêdayî Tirkiyê ve hatin şîrove kirin. Girêdayî vê yekê bi giranî perspektîfeke dîrokî hat vegotin.[6]

Wek mînak seroka komeleyeke jinan balê dikişîne tevgera jinan a dema Imparatoriya

[6] Di vê çarçoveyê de hin hevpeyvîner* navê hin serokên jin, wekî mînak Aktîvîstên Kurd û/an jî sosyalîst, bi lêv kirin (wek minak: Zin & Emek 2015: 33-36).

Osmaniyan, ku tê de jin „ji bo mafê xwe [di nav] lêgerîneke cidî“ *(ciddi bir hak arayışı)* de bûne. Piştî bidestxistina hin mafên jinan di bin sîwana damezirînera Komara Tirkiyê Mustafa Kemal Atatürk heta 1980'yan têşeyeke rêxistinbuyînê ava buye. Di nav de tenê alîkarî û piştgirî li jinan hatine kirin, lê mafên jinan nebûne mijar. Piştî 1980 jin wek takekes hin xurtir pêş de derketine, di hemî qadên jiyanê de bi armanca pêşxistina hişmendiya jinan tevgerên jinan hatine ava kirin (Anonîm 2014: 15). Nêrîna dîrokî derfeta avakirina vegotina xwe ya kevneşopiya serhildêr dide jinan. Mînaka herî balkêş ji bo vê yekê Sema Kendirîci Uğurman, Seroka Komeleyên Jinên Tirk TKB, dide. Sema Kendîrîcî Uğurman behsa ‚bêdengiya' dîroka Tevgera Jinan a Osmaniyan di dema Komara Tirkiyê de dike û di vir de balê dikişîne şelandina vegotîna dîrokî (Kendirici Uğurman 2014: 15).

Li dijî nêrîna ku xwe dispêre pêşketina netewî, aktîvîsta Kurd Sara Aktaş di „tekoşîna jinan“ *(kadın mücadelesi)* de fenomenekê ku hemî dîroka şaristaniyê de xuya dike, dibîne. „[…] nexwe erê, dîroka dîlgirtina jinê heye, lê di heman demi de dîroka serhildanê ya jinê jî heye.“ (Aktaş 2015: 11)[7] Vê tekoşînê ji sedsala 19. şûn de destpêkirin ji bo berdevka Kongreya Jinên Azad KJAyê nêzîkatiyeke „rojavayî“ *(batı merkezli),* „oryantalîst“ *(oryantalist)* e. Ji dêl vê yekê Aktaş „tekoşîna Hypatiayê“ *(Hypatia'nın direnişi)* ya ji Iskenderiyê ku di sedsala 4. de pêk hatibû ji bo tevgera jinan wek xala werçerxê dinirxîne (Aktaş 2015: 11).[8] Zanyara ji Enqerê Alev Özkazanç tevgera jinan li dij vê wek „tevgereke modern“ *(modern bir hareket)*, ku li Rojava pêş ketiye dibîne (Özkazanç 2014: 4).

Di pênasayên derbarê tevger(ên) jinan de, ku ji hevpeyvîner*an hat xwestin, di hin têşeyan de têkilî bi femînîzmê re jî hat danîn. Beriya beşên guncav ji daneyên hevpeyvînan bên pêşkêş kirin, divê destpêkê hişmendiya zanistî ya femînîzmê bê şîrove kirin.

Notz têgeha femînîzmê wek teoriyeke sîyasî, tevgereke civakî u ji salên 1970'an û 1980'an vir de wek dîsîplîneke zanistî dinirxîne (Notz 2011: 12). Li gorî Thiessen şecereya têgehê bi awayekî dîrokî yeksan nîkare bê şîrove kirin (Thiessen 2010: 37–38). Gerhard femînîzmê wek „teorîyeke civakî an jî têgeheke civakî, […] ku wek ‚îzm'ên an jî ‚qewimînên mezin' ên

[7] „[…] yani evet kadının köleleştirilme tarihi var ama aynı zamanda kadının bir direniş tarihi de var.“
[8] Ji bo aktîvîst Komeleya Piştgiriya bi Jinan a Bodrumê Figan Erozan tevgera jin di sala 1600'an de destpê dike (Erozan & Karslı 2015: 8).

modernîteyê tevgerên civakî yên jinan pêş xistinê, damezîrandine an jî hilgirtine“ dinirxîne (Gerhard 2004: 294). Ji bo Lenz femînîzm teoriyeke sîyasî ye û bi giştî „bi hejmarekê zêde hemû nîqaş û hizirandinên li ser azadî, xweserî, wekhevî û di têkiliyên zayendî de peywendî di nav xwe de dihewîne.“ (Lenz 2002: 36–37) Li Tirkiyê di nîqaşên zanistî yên di derbarê lêkolînên jin û zayenda civakî de, li gorî Somersan, têgeha femînîzmê girêdayî kevneşopiyeke „rojavayî“ tê nirxandin û daxwaza guhertina esasî di binyatên civakî yên baviksalar-serdest de dike (Somersan 2011: 112). Ji Zanîngeha Enqerê Serpil Sancar jî tevgera femînîst wek rêxistineke „pergalî“, „binyatî“ ku li dijî baviksalarîyê avabûye, rave dike (Sancar 2014: 28).

Da ku xalên cuda yên têgehê ku li qadên lêkolînê hatin ravekirin bi giştî karibin bên aşkere kirin, ji bo vê lêkolînê pênaseya Rosemary Hennessy di cihê xwe de ye. Hennesy femînîzmê wek li jêr hatiye nivîsîn pênase dike:

> […] [Femînîzm] wek koma nîqaşan, têgihîştinên rexnegirî, tekoşînên civakî û tevgerên wekhevîxwaz [e.] […] [Ev] dixwazin têkiliyên zayendî yên baviksalar ku zirarê didin hemî mirovan û hêzên civakî yên zordest û mêtînger ku bi taybetî şiklê didin jiyana jinan, fêm bikin û biguherin. (Hennessy, ji Thiessen hat girtin 2010: 37–38)

Wek faktora bandorê di têkîlîgirtina femînîzmê de pozîsyona hevpeyvîner*an – xwe bi nasnameyên xwe yên pisporên zanîstî di nav tevgerên jinan de wek aktîvîst bi cih dikin, an wek aktîvîstên tevger(ên) jinan bêyî rola xwe ya akademîk cîh digrin – wek rastiyeke zelal derket holê.

Hin akademîsyen, wek Aksu Bora, angaşta teorîk a femînîzmê destnişan dikin. Li gorî wê hemî tevgerên ji bo mafên jinan û zextên li ser jinan ku bi awayên curbecur û qadên cuda dimeşe, têdikoşin wek tevger(ên) jinan dikarin bên pênase kirin. Di vê çarçoveyê de têgeha femînîzmê li gorî nêrîna wê rolekê peywendidar dilîze: „Teoriya femînîzmê dikare di navbera wan [tevgerên jinan] de bi hev ve girêdanek ava bike û bi vê teoriyê tevgereke siyasî, girêdayî hevdû derdikeve holê.“ (Bora 2014: 18)[9]

[9] „Bunların arasındaki bağlantıları kurabilen bir teorisi var feminizmin ve bu teoriyle bağlantılı bir politik hareket

Aksu Bora jihevcudahiya tevgerên jinan, ên wek mînak di nav tevgera derdorê an ji di tevgera mafên mezêxer*an de bi giştî cih digirin û tevgerên femînîst bi vi awayî dinirxîne: Femînîzm dikare di navbera zexta li ser jinê di nav civakê de û rewşa civakê de girêdayîbûneke teorîk û binyatî bibîne. Ji ber vê yekê femînîzm teoriyeke civakî ya yekpare ye, ne tenê bi jinan û mafên jinan têkîldar e, dikare tevgerên cihereng di nav xwe de bihewîne: „Divê zêdetir li tevahî bê nêrîn, vê yekê jî femînîzm dikare bike.“ (Bora 2014: 18)[10]

Li dijî Bora Zanyar Alev Özkazanç balê dikişîne ser têkiliyên nêzîk ên di navbera tevgera femînîst û tevgera jin û têgeha ‚tevgera jin‘ wek kategoriyeke bilindtir dinirxîne:

> Ne ku ez dibêjim tevgera femînîst bi giştî parçeyeke tevgera jinê ye. Ez pêwîst dibînim bibêjim tevgera jin. Ez dibînim di hin beşên cuda yên tevgera jinê de, rêbazên wê de, di dînamîkên wê yên pêşketinê de hin fikar, pêwendî û şêweyên femînîst ên serdest hene. (Özkazanç 2014: 4)[11]

Herweha ji bo Özkazanç teoriya femînîst nikare bi giştî ji tevgera jin (a femînîst) cuda bê hesibandin. Ew di wê baweriyê de ye ku di xebata wê ya akademîk de „[…] teoriyê li derveyî tevgerê, li derveyî dinamîkên wê yên pêşketinê bidestgirtin be wate û gelek zehmet e […].“ (Özkazanç 2014: 6)[12]

Ji Koalîsyona Jinan a Enqerê İlknur Üstün tevgera femînîst wek „hêza motorîze“ ya tevgera jinê dibîne: „Ango ger li vir sîyasetekê bê daxuyanîn, li vir hin zêdetir sîyaseta femînîstan bi serdest dibe.“ (Üstün 2014: 50)[13] Aktîvîstekê ji Kolektîfa Sosyalîst-Femînîst a Enqerê tevgera femînîst an femînîzm bi heman şeklî wek „pêşaniya me“ dibîne û bi vî awayî bi qasî Üstün balê dikişîne wateya navendî ya femînîzmê ji bo tevger(ên) jinan (Anonym 2014: 13). Lê ji bo zanyara Zanîngeha Gaziyê û rêvebera Navenda Lêkolînên Jinan Anka ‘yê li Enqerê Suna Başak

---

haline geliyor.“

[10] „Daha bütünlüklü bakabilmek lazım, bunu da feminizm yapar.“

[11] „Ben feminist hareketi tabi genel olarak kadın hareketinin bir parçası olarak da görüyorum demeyeyim. Kadın hareketi demeyi önemsiyorum. Kadın hareketinin çeşitli dallarında, ekollerinde, gelişim dinamiklerinde değişik feminist kaygıların, ilgilerin ve tarzların egemen olduğunu görüyorum.“

[12] „[...] kuramı hareket dışında anlatmanın, onun gelişim dinamikleri dışında anlatmanın çok zor olacağını ve anlamsız olacağını […].“

[13] „Yani bir politika belirleniyorsa burada daha çok feministlerin şey yaptığı bir politika egemen oluyor.“

„bîrdoziyeke femînîst“ tenê ramanên cuda yên ku bandor li ser tevgerên jinan dikin e (Başak 2014: 13).

Ji Navenda Jinan KAMERê ya li Diyarbekirê Nebahat Akkoç tevgerên jinan, ger ji bo wekheviyê têbikoşîn û xwe bi xwe wek [femînîst] bi nav nekin jî, di bingeha xwe de wek tevgerên femînîst dibîne (Akkoç 2015: 47-49). Akkoç di hevpeyvînê de ji bo balê bikişîne pirrengiya femînîzmê û hêza wê ya pênasekirinê gotina bell hooks ku dibêje „bi qasî mirovên femînîst ên li ser ruyê erdê têgehên femînîzmê hene“ (‚dünyadaki feminist insan sayısı kadar feminizm tanımı vardır‘), bilêv dike (Akkoç 2015: 43). Aktîvîst Gaye Cön ku ji bo KAMERê li Muğlayê dixebite, femînîzmê wek ‚modeleke rêxistinî‘ ji tevgerên jin cuda digire dest û bi awayekî hin esasîtir ji ‚têşeyên rêxistinên‘ din cudatir pênase dike:

> […] tevgera femînîst li ser esasa mafan xwe ava dike û li ser vê esasê ji bingeh de xwe bi rêxistin dike. Têşeyeke rêxistinî ku gorî pêdiviyên herkesî rêxistinê ava dike. […] hiyerarşiya binyatî red dike, cudakirinê red dike, şîdetê […] red dike, tiştekî weha bi rêgez e. (Cön 2015: 14)[14]

Redkirina hiyerarşiya binyatî di têşeya rêxistinî ya femînîst de wek mînak di „têkiliyên berwarî“ (yatay ilişki) yên di navbera aktîvîstan de xwe dide der (Cön 2015: 16).

Dema hin hevpeyvîner* tevgera femînîst wek rêbazeke (diyarker) di nava tevger(ên) jinan de bi cîh dikin (wek mînak: Acar 2014: 8; Şahin Güngör 2015: 26; Üstün 2014: 50), pisporên din bi awayekî zelal tevgera femînîst ji tevger(ên) jinan cuda digirin dest (wek mînak: Bora 2014: 18, 44; Cön 2015: 14).

Her çiqas hevpeyvîner* heta neha bi pirjimarî bilêv nekiribin jî pêşniyara têgeha tevgerÊN jinan di hevpeyvînan de bi baldarî hat pêşwazî kirin û ji hêla hin zanyar û aktîvîstan ve nîqaşên di vê mijarê de hatin bilêv kirin. Handan Çağlayan, yek ji wan hevpeyvîneran e ku balê dikişîne ser bikaranîna yekjimar an pirjimariya têgehê, ku di çarçoveya sîyaseta jin û zayendî ya li

[14] „[…] feminist hareket, gerçekten hak temelli bir hareket ve tamamen tavan örgütlenmesinden, taban örgütlenmesinden giden bir hareket. Herkes kendi ihtiyacından yola çıkarak örgütlenmeyi yaratan bir örgütlenme modeli. […] yapısal hiyerarşiyi reddeder, ayrımcılığı reddeder, şiddet […] reddeder, böyle ilkeli bir şeydir.“

Tirkiyê de tim tê nîqaş kirin. Ew bi xwe digihîje wê encamê ku bi pirjimari bikaranîna têgehê ji bo fêmkirina mijarê di cîh de ye:

> […] ji dêl tevgereke jinê ya yekane û hevpar, tevgerên jinan, – girêdayî cudatiya jinan – carekê ve bi gelek daxwaz an jî daxwazên cuda derdikevin. (Çağlayan 2014: 16) [15]

Bi heman rengî ji Rêxistina Tora Jinan *Uçan Süpürge*yê ya li Enqerê Selen Doğan ji ber sedemên „parçeyên cuda“ *(farklı dilimler)* û „riyên cuda“ *(farklı yollar)* – û girêdayî nifşên jin ên berê – mijara „tevgeran“ *(hareketler)* wek li jêr dinirxîne:

> […] tevgera jinan, ez wê – bi awayekî vekirî– tim bi giştî fikirîm û […] heta ku we vê pirsê ji min kir, nayê bîra min ku min tevgera jinê bi pirjimarî bi kar anîbe. Lê dema ku em neha diaxivin, têdigihîjim ku, […] pêdiviyeke weha heye. (Doğan 2014: 30)[16]

Li gorî Doğan pirrengî û cudatiya tevger(ên) jinan bi taybetî bi pêşketina Tevgera Jinên Kurd, Tevgera-LGBTI, Tevgera Mafê Mirov û Zarokan (Doğan 2014: 30) derket holê. Herweha ji Koalîsyona Jinan Ilknur Üstün di wê fikrê de ye ku ji ber ciherengiya rêxistinbuyinê, berjewendiyan û têşeyên xwe îfadekirinê mirov nikare tenê qala tevgerekê bike (Üstün 2014: 22). Ji ber vê yekê Üstün pênasekirina tevger(ên) jinan ji ber sedema taybetiya wê ya „kategorîk“ red dike (Üstün 2014: 24). Redkirina xwe bi vî awayî jî rave dike:

> Ango ev binyatekê ku mirov bibêje ev e, nîne. Carekê ciherengiyê di nava xwe de dihewîne, binyateke dînamîk e, di nava ewqas ciherengî û cudahiyê de hemiyan kirina nava qalibekê ji xwe him ji tevgerê re, him jî ji tevgeran re neheqî ye. Ango ez bawer dikim, ji bo ku mirov karibe li Tirkiyê qala tevgera jinan an jî tevgeran bike, divê mirov qala pêvajoyekê bike. (Üstün 2014: 22)[17]

---

[15] „[…] böyle tek [...] yekvücut bir kadın hareketinden ziyade, kadınların kendi farklılıklarıyla da alakalı olarak, birden fazla taleple ya da birden farklı talepleri ön plana çıkarttıran kadın hareketleri oluyor.“

[16] „[...] kadın hareketi, ben hep bunu açıkçası bir bütün olarak algıladım ve [...] siz bana bu soruyu sorana kadar da kadın hareketleri diye çoğul olarak kullandığımı çok anımsamıyorum. Ama şimdi konuşurken fark ediyorum ki, [...] böyle bir ihtiyaç var.“

[17] „Yani şudur denecek bir yapı değil, bir kere çok çeşitlilik arz ediyor, dinamik bir yapı, o kadar çeşitliliğin, farklılığın içerisinde hepsini belli bir kalıba oturtmanın kendisi zaten harekete de hareketlere de haksızlık olur.

Üstün di vê girseya tekstê de balê dikişîne ser dînamîk û xwedî-pêvajo-buyîna tevgerên jinan û rêzdarîya pêwîst ku bi vê tegehê ciherengiya aktor*ên siyasî yên jin û zayendî îspat dike.Wekî din, li gorî Üstün, xetereya aktor*an nedîtin an jî paşguh kirin derdikeve holê: „Ev jî dîtina binyatên ji hev pir cuda û ciherengî asteng dike.“ (Üstün 2014: 26)[18] Ji ber sedema bi hev re karkirina aktîvîst*an, ku ji bo jinan û LGBTI dixebitin û di navbera wan de „toreke piştgiriyê“ *(dayanışma ağı)* ya girîng heye, Reyhan Atasü-Topçuoğlu jî bikaranina têgeha tevgera jinê wek yekjimar red dike (Atasü-Topçuoğlu 2014: 11)[19]

Zanyar Alev Özkazanç têgehê bi awayekî yekjimari bi kar tînê, lê di nav pênaseya xwe ya berfireh te, li gorî hişmendiya xwe ya femînîst tevgera LGBTI û aktîvîsten jin ên misilman jî bi cîh dike (Özkazanç 2014: 23, 25). Herweha Feride Acar tevgerên jin ênKurd û îslamî jî di nav tevgera jinan a li Tirkiyê de dihijmêre. Zanyar li gel vê dest nişan dike ku ew behsa „tevgerên ku ji hêla jinan ve hatine damezirandin“ *(kadınlar tarafından gerçekleştirilen hareketler*) dike û bi vî awayî tevgera jinan ji tevgera LGBTI cuda dihesibîne (Acar 2014: 8).

Rexneyekî esasî di derbarê nîqaşên entelektuel ên tevger(ên) jinan û femînîst li Tirkiyê de ji partiya çepgirt ÖDP ya li Hopayê Nefise Yenigül formule dike:

> […] li welatên şûn de mayî yên wek Tirkiyê […] de nîqaşên bi vî awayî ji min re hinek di asta bilind de xuya dikin. Lewre pirsgirêkên rastî yên jinan cuda ne, ango ji xeynî mijarên ku em nîqaş dikin, gelek pirspgirêkên wan ên din hene. Ango bi rastî girseyeke jinan a bi nasname, bê nasname, bê kesayet û tune tê hesibandin heye û ev [girse] bi piranî ye. (Yenigül 2015: 17)[20]

Li gorî Yenigül ji ber sedemên nîqaşên li ser esasa teoriyê tên meşandin û zenûnkirina rastiyên

---

Yani sanıyorum kadın, Türkiye'deki kadın hareketi ya da hareketlerinden söz edebilmek için bir süreçten söz etmek gerekiyor.“

[18] „O da birbirinden çok farklı, çeşitli yapılanmaları görmeyi engelliyor“

[19] Aktîvîstê LGBTI Halil Kandok ji Denizliyê tevgera LGBTI, tevgera Kurd herweha tevgera oldar-muhafezekar jî di nav tevger(ên) jinan de bi cîh dike (Kandok 2015: 24). Li gorî Aktîvîstê LGBTI ya ji Amedê Arif karker*ên seksê, jinên trans di nav tevgerên jinan de nayên pejirandin (Arif et al. 2015: 23).

[20] „[…] Türkiye gibi geri kalmış […] ülkelerde bu kavramlar biraz üst düzey tartışma gibi geliyor bana. Çünkü kadınların gerçek sorunları başka, yani bizim tartıştığımız konulardan çok başka sorunları var. Yani gerçekten kimlikli, kimliksiz, kişiliksiz, yok sayılan bir kadın kitlesi var ve bu çok büyük çoğunlukta.“

jinan, tevgera jinan xwe hin ji hev cuda kiriye (Yenigül 2015: 19).

Encam

Pêşniyarên pênaseya derbarê tevger(ên) jinan ên pispor*ên sîyasî yên jin û zayendî li gorî aktor*, rêxistinbuyîn, çalakî, sedem û herweha girêdayî mijar û armancên tevger(ên) jinan tê şîrove kirin. Hin hevpeyvîner* di çarçoveya pênaseya xwe de girêdana heremî û / an jî dîrokî ya tevger(ên) civakî bilêv kirin. Her çiqas wek pirs nehatibe kirin jî pirî hevpeyvîner di danasîna xwe ya tevger(ên) jinan de femînîzmê wek tevger û/an jî wek teorî – car caran bi sînorkirî – [21] anîn zimên.

Daneya azmûnî (ampîrîk) îspat dike ku li qada lêkolînê ya li Tirkiyê di nava aktîvîst*an de û herweha zanyar*an de pênaseya tevgera jinan bi giranî bi awayekî yekjimarî tê bikaranîn. Al-Rebholz jî di lêkolîna xwe ya derbarê tevgerên civakî yên li Tirkiyê de têgehê – bi armanca çalakiyên sîyasî yên jin û civakî wek fenomen di qada sîvîl a civakî de bide nasandin – bi yekjimarî bi kar tîne. Têşeya bi pirjimarî bikaranîna tegehê di çarçoveya „pêvajoya pirjimarî û ciherengiya hişmendî ya komên jinan“ (Al-Rebholz 2011: 29) de digire dest.

Encamên azmûnî yên derbarê tevgerên jinan ên qadên lêkolînê ku di nivîsa III.2.A. de hatin raber kirin, ji perspektîfa koma lêkolînê û bikaranîna teorîk a pênaseyê, nîşan dide ku tevger(ên) jinan bi awayekî pirjimarî bilêvkirin baştir e. Lewre cudahiyên bîrdozî-sîyasî herweha heremî yên li Tirkiyê di kûrbûna hin mijaran de, di birêvebirina têşeyên çalakiyan de, herweha girêdayî derfetên hevalbendiyan de roleke navendî dilîze.

Di rastandina ragihandî (komunikatif) ya encamên lêkolîne bi akademîsyen*an re di gulana 2016’an li Zaningeha Enqerê di atolyeyekê de derxist holê ku bikaranîna têgehê ya yekjimar an jî pirjimar mijara nîqaşê ye. Hin caran bi pirjimarî bikaranîna têgehê bi mebesta xetereya jarbûna hêza guhertina civakê hat red kirin. Li dij vê li gorî zanyerekê dikare têgeha femînîzmê

[21] Hin Hevpeyvîner* di hevpeyvînan de qala pêşdaraziyên li dijî têgeha femînîzmê kirin (wek mînak: Akkoç 2015: 43; Eren 2015: 10; Keleş Yarışan 2015: 10).

wek mînak li gorî beraliyên radîkal, sosyalîst an jî lîberal bê cuda kirin.

Çavkanî

- Al-Rebholz, Anıl (2011): Frauenpolitik in der Türkei im Spannungsfeld zwischen Lokalem und Transnationalem. Di nav: *GENDER. Zeitschrift für Geschlecht, Kultur und Gesellschaft* 1, p. 28–46.
- Daphie, Priska (2011): Soziale Bewegungen und kollektive Identität. Forschungsstand und Forschungslücken. Di nav: *Journal für Neue Soziale Bewegungen* 24 (4), p. 13–26.
- Della Porta, Donatella; Diani, Mario (1998): Social Movements. An Introduction. Oxford: Blackwell.
- Gerhard, Ute (2004): Feminismen im 20. Jahrhundert. Konzepte und Stationen. Di nav: Jens Flemming, Pauline Puppel, Werner Troßbach, Christina Vanja und Ortrud Wörner-Heil (Ed.): Lesarten der Geschichte. Ländliche Ordnungen und Geschlechterverhältnisse. Kassel: Kassel University, p. 294–316.
- Lenz, Anne; Paetau, Laura (2009): Feminismen und 'Neue Politische Generation'. Strategien feministischer Praxis. Münster: Westfälisches Dampfboot.
- Lenz, Ilse (2002): Neue Frauenbewegung, Feminismus und Geschlechterforschung. Di nav: Eva Schäfer, Bettina Fritzsche und Claudia Nagode (Ed.): Geschlechterverhältnisse im sozialen Wandel. Interdisziplinäre Analysen zu Geschlecht und Modernisierung. Opladen: Leske + Budrich, p. 35–66.
- Lenz, Ilse (2010): Frauenbewegungen. Zu den Anliegen und Verlaufsformen von Frauenbewegungen als soziale Bewegungen. Di nav: Ruth Becker und Beate Kortendieck (Ed.): Handbuch der Frauen- und Geschlechterforschung. Theorie, Methoden, Empirie. Wiesbaden: VS, p. 867–877.
- Notz, Gisela (2011): Feminismus. Köln: PapyRossa.
- Somersan, Bihter (2011): Feminismus in der Türkei. Die Geschichte und Analyse eines Widerstands gegen hegemoniale Männlichkeit. Münster: Westfälisches Dampfboot.
- Thiessen, Barbara (2010): Feminismus. Differenzen und Kontroversen. Di nav: Ruth Becker und Beate Kortendieck (Ed.): Handbuch der Frauen- und Geschlechterforschung. Theorie, Methoden, Empirie. Wiesbaden: VS, p. 37–44.